12. ve 13.7.86 Pazar

"TKP'nin Sesi"

Bu yayınımızda:

- TKP 1986 Ulusal Konferans Tezleri'nin devamını (5) Spk: Nec.

ve: Kürtçe yayınımızı dinliyeceksiniz. Spk: Ah. ve Şerf.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

1

12-7-86.

Şr. Ahm.



TKP'nin sesi

Kürtçe

Guhdarên hêja,isal germê careki da avêt ser me.Dı pıraniya bajarên ku em Kurd lê dıjin.Germayi dı siyê da dıghêje 40 dereceyi. Çı heyf ku hin ji bı sedan gundê me hesreta avê ne. Lı aliki germi,lı aliki tibûn,Lê belê hukumata Ozal pêşta dajo, dıbêje em xızmetê dıbıne rojhılatê.Qasi germê,heta qat bı qat zêdetır bêşıxwıli canê mırovên me dışevıtine.Jı Diyarbekırê Derê Çiyê ji dı nama xwe da vana nişan dıke.Derê Çiyê weha nıvısiye. "Tu lı kijan kuçê mêzeki mırovên bêşıxwıli dıbini.Hukumata Ozal çıqa dıbêje "Em lı rojhılatê razandınan dıkın,hevqas ji,qahvên ku tıje mırovên bêşıxwılên pır dıbın.Mırov bıxwazın nexwazın dıponıjın, Gelo razandınên ku hukumat dıbêje qahve ne?

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

Qasi ku razandınên qahvan pıştek dıbine razandınek dın ji heye. Ev ji inşaatên qereqolan e.Pır nemaye ku lı hemû kûçan qereqolan vebıkın."

Derê Çiyê jı Diyarbekırê vana nıvısandıne.

Ferqa rewşa gundiyên Kurd ji, jı rewşa mırovên bêşıxwıl tûne ye. Jı xwe gundiyên bê erd feqir û perişanın.Gûndiyên ku çend dolım erdên wan hene ji bêderê xwe rakırın,lê belê nedıkarin deynên xwe bıdın, ne ji dıkarın hewcedariyê xwe binın ci.

Èdi karê şıvantiyê ji zu bı zu dest mırova nakeve.Gelek kes bona şıxwılên dersase bar kırın çûn Edenê,Jı wana bı sedan kes dı bın tayê da ,yan ji dı bın nexweşiyên dın da evê bımırın herın.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

Ĵiyina me Kurdan ava ye.Wê jiyinê Evren û Ozal tinên serê me. Ew vê rewşê bı xwestın û zaninê çêdıkın.Xızaniya me bı xebata Evren û Ozal tê ajotın.Ĵiyina me ji ancax bı qireta me,bı yekbûna me û bı tekoşina me evê xweş bıbe.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

4

Şr.Ahm.

6.

TKP'nin Sesi

Kürtçe

Konu:Şovenizm

Guhdarên Delal,Bı salanên ku hêzên karbıdest lı dıji gelê Kurd politika şovenizmê dıdominın.Lê belê,dı demên dawiyê da şovenizm bona gelê me gihişt rewşek xeteri.Hêzên karbıdest çı wextê têkevın nav tengasiyê,hema destên xwe davêjın şovenizmê.Bı politika şovenizmê,ne gelê me,ne ji welatê me tu xêrekê nabine.Gelê Kurd Tırk û hemû gelên herêmê zıraren pır mezın dıbinın.Dıjmınatiyê dıkeve nav gelan.Evren û Ozal disa dest avetın şovenizmê.Kıncên leşkeri li xwe dıkın dekın sinoran,gelan kış dıkın.Bı propagandayê şovenizmê dıxwazın ku zordesti û zorkariyên ser gelê Kurd veşırın.Dıxwazın ku hemû hêzên muxlefetê lı pey xwe kaşbıkın.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV

Rejima faşist jı aliki, lı ser gel zorkari û zordestiya xwe zêde dıke ku emrê xwe dırêj bıke. lı aliyê dın bı politikaya ku bona emperyalizmê tê ajotın, gelên hêramê dıxînın nav xeteriyek mezın. Diktatoriya Evren û Ozal lı Kurdıstana Tirkiyê şerê ku lı dıji gelê Kurd ~~xxxxxxxxx~~ ~~tinen~~ didın domandın ~~çimi diktatoriya Evren û Ozal nake~~ ji têr nabinın.

~~xxxxxxxxxx Evren û Ozal~~ vext bı vext lı dıji gelê Kurdên İran û Iraqê ji seri lı êriş û operasyonan dıxın.

Jı sedema politika şovenist ya rejimê hemû hêram lı bendê xeteriyên mezın dımının.

Diktatoriya faşist derevên şovenist yen xwe wısa ~~zxxxxxx~~ dıxa pır dıke ~~ka~~ ~~mina ku~~ hemû gelên cinarê me weka dıjmınên ~~me bın~~ bı me têne naskırın. Diktatoriya faşist dıbêje ku "Çavê Yunanistan dı Egeyê daye. Dıbêje "Çavê Suriyê Dı erdên me da ye. Dıbêje Bulgaristan zordestiyê

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

lı Tırkan dıke.Dıbêje "Jı sinorên İran û Iraqê terorist ~~tên~~ welatê me.

Lê belê gere em vana hemûyan zanıbın ku jı gelên cıran tu yek ji dıjmınên gelê me nînın.Hemû gel destbıratiyê dıxwazın,bı hev ra pevendiyên ~~rind~~ û jiyine dıxwazın.

Evren û Ozal ji şovenizmê pêşta derdıxın dışıxulın ku rastiyan jı gel veşırın.Bı vi ya jix welatê me dıkşinin nav agır.Hıngê rêbırına han hukım bajo ne kıfşe ka xeteriyên ça mezın wê verıne ser welat û gelê me.Jı bona welatê me û jı bona gelê me xeteriya mezın rejima Evren û Ozalx e,~~Bxjixbona welatê me xeteriya mezın~~,politikaya wan ~~dışinın politika~~ şovenist û xeteriye û xx jı bona welatê me pır û pır ~~bı xeteriye~~.Ji vê sedemê ji lı dıji şovenizmê derketın vezifa hemû welatparêzaye.Gere gelê Kurd lı dıji diktatoriye û politikaye şovenist derkeve denge xwe bılındbıke.Lewra jı şovenizmêgelê Kurd û Tırk tu tış- teki qezenç nakın.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

~~TKP'ninxSesi~~

3.

GH. lı Tırkiyê bı salane lı ser maddên 141 û 142 yên Zagûna Ceza ya Tırk da têye xeberdan.Ev madde ponıjandınê zıncirdıke.Bona çina karker partiya. xweye rasti damezırandınê qedexedıke.Parastına mafên gelê Kurd suc qebûldıke. Ango ev 141 û 142 lı hêmberê demokratikkırına Tırkiyê bûye pındam û dısekıne.

Çendek berê hat eşkerekırın ku ev madde wê werın guherandın. Rojên pêşinda parlamentoya ku Özal têda cıritê davêje wê babeta han hılde dest.Diktatoriya 12 Kewçerinê zagûna han careki dın guhırandıbû û cezayê wi gırankırıbû.Vêga hım hundurokên van maddên zagûnê têne fırehkırın.Hım ji ceza têne gırankırın.

Gıregırên hukumatê dıbêjın ku,bona pêşiya komunizmê were gırtın van guhırandınan pêktinın.Qaşo bona bıkarıbın pındambıkın welat qet qeti nebe cezayên 141 û 142'yah gırandıkın. Dıbêjın

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

4.

"me berdestkırına pejnên netewi kıre sucek".Ahaki armancdıkın her têketınek ku naçe xweşê wana,bı maddeyên 141 û 142'yan va bıdın cezakırın.

Hukumata Özal dıxweze maddeyên 141 û 142'yan bıguharine, cezayên van madeyan hê ji gıranbıke.Ger bıgêhije armancên xwe: Kesên ku lı dıji mêrkuştınên bajarên Kurd deng derxinın bı suc werın hesıbandın.Yên ku lı hemberê propogandayên şoven bısekıne bı suç were ditın.Wê keb nıkarıbe lı pêşberê zordestiyên ser gelê Kurd eşkere tevger dayne.Bı qısekıri,bı guhırandınên han her têketına demokratik weka sucek têye ditın.Dıxwezın tariya ser welat heta hetayê bımine.

Dı tentêla han da Kurd heqqên xwe bıxwezın,wê sucê heri mezın pêkbinın. Erişên ser gelê Kurd û parêzdarê mafên gelê Kurd gurdıbe.Evana hemûnişandıdın ku tekoşina peydakırına mafên gelê

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

5.

Kurd û tekoşina peydakırına demokrasiyê mehkem bı hevra gırêdayiye.Gelê Kurd ku jı pêkaninên dıjdemokratik û ji êrişên faşist zıramên mezın dıbin,dı tekoşina dıji 141 û 142'yan ji,dı tekoşina damezırandına demokrasiyê ji ciyê xweye lı qorên pêşin tıjedıke.Wê tıji bıke.Jı her bajareki Kurd da bona demokrasiyê deng bılındbıbın. Gere bılındbıbe ji.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

A-10

8.

Me hevalê ser ya Ho Şi Min ji windakır.

Bırayên hêja, Xwişkên delal, Sekreterê Gıştî ya Komita Navçayi ya Partiya Komunist ya Viyetnamê Hevrêyê meyê hêja Le Duan çu ser heqiya xwe. Serokê gelê Viyetnama mêrxwas Le Duan 79 salibû.

Bı ~~w~~ vefatkırına Le Duan, ça gelê Vietnamê, wıssa ji hemû gelên cihanê, û tevgera karker û komunist pêşengek xweye ~~jabare~~ şehotî wındakır.

Sekreterê Gıştî ya Partiya Komunist ya Tırkiyê hevrê Haydar Kutlu lı ser bûyera hane reş mesajek serxweşiyê şande Partiya Komunist ya Vietnamê. Hevrê Kutlu dı mesaja xwe da daxweziyên serxweşiyê ya gelê me û çina meye karker şande gelê Vietname mêrxas.

Serokê Vietnamê Le Duan roja 10'ê Tırmehê jı ~~xxx~~ me veqetiya. Ew dı sala 1907'da dı 7'ê Cotanê da jı diya xwe bû. Hê 19 sali tevê welatparêzanbû ku ew lı dıji kolonyalistên Frensıs şerdıkırın, Dı sala 1928'an da tevê Komela Civanên Şoreşger ya Vietnamê

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

bû.Komela han dı sala 1925'anda bı destê Ho Şi Min hatıbû damezırandın. Dı sala 1930'yan da Partiya Komunist ya Vietnamê hat damezırandın û Le Duan ji tevê wi bû,dı sala 1931'an da ji dı nav komisyona propogandayê da ciyê xwe gırt.Lı dıji kolonyalistên Frensız pêşêngiya gelek seri hıldana gelê kır,û jı vê dedemê jı aliyê rejima kolonyalist bı cezayê 20 sal hepsê gıran hat bızakırın.Lı gırtigehên Hanoi,Son La raza,Jı zindanên Con-Son ku jêra dıbêjın "Gırava mırınê" derbasbû".

Le Duan

Dı sala 1936'anda bı effûya gışti ku jı aliyê hukumeta Eniya Gelê Frensız hatıbû derxıstın gıhişte azadiyê.Ev lavê mêrxwesya Vietnamê,tevê hevalên xweyên şer bı mırandvaniyek mezin wezifên ku partiya wi dıda wi pêkani.Le Duan dı sala 1939'an da dı Navça Komita partiyê da ciyê xwe gırt.Tım û tım dı nav qorên

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TUSTAV

Partiya Komunist da,bona azadi û rızgariya gelê Vietnamê tekoşin kır.Dı sala 1969'an da,bı wındakırına Ho Şi Min,bû Sekreterê Gıştî.Pêşengiya şera rızgarkırın û yekkırına welatê Vietnamê kır. Gelê Vietnamê dı pêşengiye Le Duan mêxwesiya xwe nişanê hemû cih hanê kır û serê emperyalistên Emeriqayê lı pêşiya xwe xwerkır. Eva jı deh salan zêdetırbû ji dı pêşengiya wi da gelê Le Duan dı rêya damezırandına Sosyalizmê gavên avêtın.Dı dema han da gelê Vietnamê lı cihanê ji hundurê tekoşina aşitiyê ciyê xwe gırt.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TÜSTAV